

## Bûyera Lehiyê

Bîrewerîn

Hesenê Cumî

**Li** ezmanê çiyayê Hawarê , tîrêjên rojê ewran diqelêşin , perên xwe bi ser Hawarê de berdidin . Sûsin , kulîlk û giya , Çiyayê Hawarê xemilandine . Bihna buhara rengîn dikeve pozê mirovan . Dengê bilbil û şalûran , mîna sînfoyonekê , bi ber gelî û nawalan dikeve .

Ji nişka ve , qîrî bi gînwawer û teyrikan dikeve , ewrekî reş û tarî bi hev dikeve , baran bi hêz dibare , deziyên baranê mîna tenên tizbiyan , bi ser Çiyayê Hawarê de têne xwar , ax , giya , kulîlk , zinar û latên Hawarê , bi ber pêlên lehiyê dikevin û di gelî û newalan re serqotî hev dibin .

Hemo , koka dara êvrisê hambêz dike û xwe dimelisîne . Di demeke kurt de , her tişt tê guhartin . Li şûna , kulîlk û giyayê Hawarê , bilî darên tamarên xwe kûr berdane erdê nema ye . Ev bûyer , Hemo vedigerîne şeva reş û tarî , şeva ku bi hêz li derî dikeve, bêtirî panzdeh leşkeran , derdora malê çember kiribûn , di ber cilên xewê û çav girtî de, dibin paş deriyê reş . Ew deriyê ku , mirov ji hezarên salan ve , ji ber dike qîr , hawar û dinale , deriyê jiyana mirovan dixwe , deriyê ku , têde dixwazin mirovatiya mirovan wenda bikin , bipişêvin û mêraniya wî bişkînin . Di paş wî derî de , bi hezaran xort û keçan hatine girtin . Hîn Hemo di wê xwenê de ye . Kevokê xwe bi hêrs davêje hambêza wî . Kevok , ji tîrsa re diliklike , Hemo kevokê hambêz dike destê xwe di ser govdê wê re dibe û tîne . Rasterast , liklikandina wî , li pêş serbazê polîs tê ber çavan . Kevoko ?! . Ew tîrsa , ji hezarên salan ve di dilê mirovan de hatiye çandin . Ta kîngê , wê ta kîngê

bimîne ?!. Ta kîngê wê ji vê tîrsê rizgar bibe ?.

Piştî kevok germ bû , kevok berda , kevok bi banî ket, di ser serê wî re, basikên xwe hejand . Qey tu dibêjî kevok sipasiya wî dike . Wê hîngê , bejina Roşînê ya zirav , porê dirêj û tarî, çavên reş û belek , rûyê geş û dîmê top , dîtina pêşîn ya li ser kaniya jorîn , soz û peymana wan bi hev re , destlibakirina dawî ya şeva girtinê bi bîra wî tîne .

Lehî geyîkekê ( xezalek ) bi çûk dide ber xwe û berve newalê dikşîne , geyîk , bi hemî hêza xew ve , hewil û berxwe dide da ji nava lehiyê derkeve . Lê mixabin , hêz û hovîtiya lehiyê nahêle ew ji wê bûyerê rizgar bibe û jiyana xwe berdewam bike.

Ev jî, wî vedigerîne xişm û bêtara 12 ê Avdara 2004 an, ya li bajarên Qamişlo, Serê Kaniyê, Dirbasiyê, Amûdê, Tirbesipiyê, Kobaniyê, Heleb, Zorava û Efrînê qewimî ne. Fîşekê di dilê Gîvara, neviyê Hemîtê kal re debas bû ye. Kuştina hunermendê daholvan Ne'so di bin lêdanê de, kuştina keça çeleng Ferîde û xwîna hemî şehîdan, yên bi hezaran kulîlk bi xwîna xwe avdane tîn ber çavên wî.

Di bin darê de, Hemo ji xwe dipirse: Gelo, ma ev xişm û bêtara vê lehîyê, ne mîna xişm û bêtara bûyera 12 ê Avdara 2004 an e ?!. Ma ne herdu jî, hov in, li kuştina mirovatiyê digerin !. Dixwazin jiyane bê mirovatî bikin !!.

